# Mahmûd Lewendî



Institut kurde de Paris

# mala xwedê

illustrasyon: MAMOSTE

BR. - K.L.
1482

Institut kurde de Paris

BK.-K.L. 1402

amadekar:
Mahmûd Lewendî

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

# mala xwedê

(pêkenîn)

illustrasyon:
MAMOSTE

Weşanên Hêlîn
Çapa Yekem: Eylul 1992

Institut kurde de Paris

©-M. Leweridî

Pergala qapaxê:
M. Serdar Karataş

Adres:
Duvedsv.7-2tr
162 23 Vällingby/Sweden

ISBN: 916301221-9

## Pêşgotin

Di 1985'an de min bi navê **Mîrkut** kovareke mîzahî derdixist, heta 1987'an derket lê paşê ji ber rewşa ekonomîk kovar nema derket. Demekê jî di kovara **Berbangê** de bi navê **Sîrkut**, paşê bi navê **Tirşik** min quncikek nû vekir. Pişt re jî di rojnama **Armancê** de bi navê Beroş min quncikek nû ya mîzahî vekir. Li gel nivîsên mîzahî û karîkaturan, me gelek caran cih dida pêkenînan (fiqreyan) jî.

Wextekê jî di kovarên Kurd Li Spånga, Dîdar û rojnama **Azadî** de me hin pêkenîn belav kirin. Pişt re min nihêrt ku me ji sedî bêtir pêkenîn belav kirine, yanê dikane bibe kitêbek biçûk a pêkenînan û min rabû ji wan pêkenînan ev pirtûka amade kir.

Ji derveyî pêkenînên Kurdî, pirranîya pêkenînên din ên ku di vê kitêbê de ne ji zimanên xerîb -wek Fransî, Swêdî, Erebî û Tirkî- hatine girtin. Yên ku min ji zimanên xerîb girtine, ji wan hinek min adabteyî Kurdî kirine, hinek jî rasterast hatine tercumekirin.

Li Kurdistana Bakur xwendin û nivîsandina bi Kurdî kêm e. Gava ku mirov li tîraja kovar û rojnameyên Kurdî dinihêre, mirov vê rastîyê dibîne. Ji ber wê yekê heta ji destê min hat, min tekstên pêkenînan kurt kirin daku her kes bikaribe bi hêsanî bixwîne.

Her weha heval **Mamoste** jî ji bo her pêkenînekê karîkaturek çêkir ku bêtir bala xwendevanan bikşîne.

Armanca sereke ya ji vê kitêbê ew e ku bi qasî dilopekê be jî feydeyek bigihîje xelkê me daku ji xwendin û nivîsandina Kurdî hez bikin. Di vê riyê de bi qasî serê derzîyekê jî em bi ser kevin, emê xwe bextewer bibînin.

M. Lewendî

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris



## CAN BI ŞÛNDE NAYÊ LÊ ROJÎ TÊ!

Meha rojîyê ye. Lê rojî ketîye havînê. Wekî her kesî Apê Leto jî rojîyê digre. Heta nîvro îdare dike lê di pê nîvro re ji tîhna nikare xwe bigire hema bi dizîka diçe ser kanîyê û avê vedixwe. Û çima mellê gund ji wê de nayê! Dinêre ku Apê Leto avê vedixwe. Welle hema melê me xwe pik dike û diqehere û bi ser Apê Leto de diçe û dibêje:

-Lawo ma tu fedî nakî, tu ji Xwedê jî natirsî ? Tu di vê rojîya remezanî mubarek de çawan dikarî avê vexwî, ma tu kafir î, tu çi yî!

Apê Leto:

-Melle, bi Xwedê ez gelekî tîh bûbûm, ji tîhna qirika min êdî ziwa bûbû û ez hinekî jî fikirîm ku çawa be rojî îsal biçe ewê salek din dîsa were, lê heke ez ji tîhna bimirim û ev can biçe êdî bi şûn de nayê!

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**MA HIŞÊ WÎ HEBA..!**

Gundî hemû li dorê civîyabûn. Wî jî li erebanê dixist û digot:

-Hê Allah hê!

Selawat li nebî Muhemmed hê hê!

Carê rabû pê û li dora xwe zîz bû. Bi zîzbûnê re, him li erebana xwe dixist, ji alîkî de jî qesîde digot.

Ji gundîyan yekî, ji gundîyekî din pirsî:

-Ero tu dibînî, çawa li dora xwe zîz dibe, eynî wekî perwanê ye. Gelo ma hişê wî naçe?

Gundîyê din:

-Na lo, ma hiş di serê wî de heba qet weha dikir!



Institut kurde de Paris

**EZÊ PÊ ŞORBÊ VEXWIM!**

Carekê gundîyek diçe li malekê dibe mêvan. Kebanîya malê jê re şorbê tîne datîne ber, lê kevçî ji bîr ve dike. Mêvan dinihêre ku kebanî serwext nabe, dibêje:

-Xuşkê xuşkê, ca ji kerema xwe tu dikarî ji min re kêrê bînî!

Kebanî:

-Mêvanê delal ma tu yê çi bikî bi kêrê?

Mêvan:

-Wele ezê guhê xwe jêkim û bikim kevçî daku pê şorbê vexwim!



**DI PÊ A'YÊ RE KÎJAN HERF TÊ?**

Li dibistanê mamosta ji Lezgîn dipirse:
-Lezgîn, tu herfên alfabê hemûyan dizanî?
-Belê mamoste, dizanim.
-Ê de ka bibêje di dû herfa A'yê re kîjan herf tê?
-Di dû herfa A'yê re hemûyên herfan tên..!



Institut kurde de Paris

**BAVÊ MIN JÎ DIBÊJE!**

Du zarokan bi hev re qise dikirin:

-Bavê min dikare li bavê te xe!.

-De wê de here lo, tu jî hema derewan dikî!

-Birayê min ji birayê te baqil û jîrtir e!

-Ehh! derew, te dîsa derew kir!

-Dîya min ji dîya te xweşiktir e!

-Haaa, ha! a îcar te rast got, lewre bavê min jî her tim vê yekê dibêje..!



**ÇEND SALÎ YE...**

Hakim ji jinika şahid dipirse:

-Tu çend salî yî?

Jinik:

-28 sal û çend meh!

Hakim:

-Yanê çawa çend meh?

Jinik:

-Yanê ez 28 sal û 115 mehî me!

Institut kurde de Paris

**JUJÎ**

Jujî bi têjikên xwe şa dibe û dibêje:

-Ez bi qurbana pirtûka we ya hevrîşim bim!



Institut kurde de Paris

**HEMA BILA BIQÎRE!**

Rojekê şivanek diçe bajêr. Dinihêre ku yek derketîye ser minarê û diqîre. Şivan ji yekî dipirse:

-Evê hanê ji bo çi derketîye wê derê û weha diqîre?

-Ew muezîn e, azanê dixwîne.

-Azan çi ye?

-Azan azan e, bang e ji bo nimêjê.

-Ma zerara pêz tê de heye an na?

-Na, na zerara pêz tê de tuneye!

-Ê wê wextê bila bang bide, madem ku zerara pêz tê de tuneye hema dilê wî çiqas dixwaze bila biqîre!



**DEREWÎN**

Yekem:

-Te di wê bîrê de çi dikir?

Duwem:

-30 sal berê seeta bavê min ketibû vê bîrê, min jî îro derxist, tu tiştek pê nehatîye, her wekî agir kar dike!

Yekem:

-İcar ew çi ye! Ê min, bavê min 30 sal berê ketibû vê bîrê, me derxist hê jî sax bû!

Duwem:

-Errrik, çi derew!

Yekem:

-Na ne derew e. Çimkî bavê min di bîrê de seeta bavê te qurmîş dikir!

Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

**EREB DERKET!**

Li Kurdistana Iraqê yek hebû jê re digotin Beşîr Muşîr. Beşîr Muşîr piştî çil salan radibe jina xwe ber dide. Jê dipirsin "bo çi?".

Dibêje:

-Wele birako hurmetê pir baş bû, lê ereb derket!



**DI DEWSA BAVÊ XWE DE!**

Polîs:

-Tu çend salî yî?

Kur:

-10 salî.

Polîs:

-Deh salî yî û tu dizîyê dikî ha?

Kur:

-Welleh polîs efendî, ez bi xwe ne diz im. Bavê min nexweş e, ez di dewsa wî de kar dikim!

Institut Kurde de Paris



**XWEDÊ GUNEHKARAN EFÛ DIKE**


Mele ji suxteyan pirsî;

-Divê mirov çawa bike ku Xwedê me efû bike û bibexşîne?

Ji suxteyan yek:

-Divê ku mirov pêşî gunehan bike, bibe gunehkar!

Institut kurde de Paris



**JI TERALÎ**

Teralek pişta wî dixure, lê ji teralî û tembelîyê nikare pişta xwe bixurîne, hema hundurê destê xwe dixurîne û diavêje paş xwe..!



Institut kurde de Paris

**LAWIK HÊDÎ DIMEŞIYA!**

Mamoste ji teleba xwe ya keçikî dipirse:

-Tu ji bo çi dereng mayî?

Keçik:


-Mamoste, gava ku ez dihatim mektebê lawikek li pey min bû, hema bela xwe di min dida, ji ber wê ez hinekî dereng mam.

Mamoste:

-Ê te jî lez bikira?

Keçik:

-Lê lawik hêdî dimeşîya!



**EZ MEYMÛNÊ NAXWAZIM!**

Mîrovekî ji xwe re jineke dewlemend anîbû. Rojekê ji jina xwe pirsî:

-Erê, te li mala bavê xwe wexta xwe çawa derbas dikir?

Jinik:

-Bi meymûnê xwe.


Mêrik:

-Yanê tu dixwazî, ez jî ji te re meymûnekê bikirim?

Jinik:

-Na welle, hema bila tu her hebî û li ba min bî, ez meymûnê naxwazim!

Institut kurde de Paris



**MIN JÎ NEDÎYE!**

Padîşahek ji wezîrê xwe re dibêje:

-Divê ku tu heta sibê ji min re gotinek welê bibêjî daku bila bi pênç pera neke!

Wezîr diçe. Wê şevê xew bi çavan nakeve. Her çendî difikire lê zor e, çawa bike ku gotineke bi pênc perê qul neke bibîne..

Wezîr serê sibê tê cem padîşahî û jê re dibêje:

-Padîşahê min te bajarê Şamê dîtîye?


Padîşah:

-Na!

Wezîr:

-Wele min jî nedîye..!

Institut kurde de Paris



**BAJARÊ BISMILÊYE GÎDIPSEEEN?**

Li hêla Bismilê, ji gundê Koselîya merivek wê biçe bajêr.

Jina wî jê re dibêje:

-Ma bajarê Bismilêye gîdipseeen, Fatoşêye bîr don getiiir!

Mêrik:

-Ma ne bilim ne qedemdiiir?

Jinik:

-Wîîî, ma hema bîr mîtro bîr nigine
Bîr mîtro jî dîger nigine,
Ellî santîm nav nigine
Girmî bêş santîm jî pizîsine getir bestir.

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**JI JINA XWE NATIRSE!**

Li qahwê yekî ji hevalên xwe re got:

-Yên ku ji jina xwe ditirsin bila hemû rabin pîya!

Yek ne tê de hemû rabûn pîya. Ji yê ranebûyî pirsîn:

-Welê xuyaye ku tenê tu ji jina xwe natirsî?

Mêrik:

-Na welle, jinikê vê sibê darek welê li kulêmeka min xistîye ku ji êşa wê ez nikarim rabim ser xwe!



**KÎ ÇI ZANE BAV ÇAWA YE?**

Yekî derewîn digot "Kes tuneye ku di ser min re derewan bike!"

Lê, wextekê bihîst ku derewînekî jê xerabtir heye. Got "welleh ezê herim vî merivî bibînim, hela kanê çawa ye, çawa dikare ji min bêtir derewan bike!" û bi rê dikeve diçe. Tê ber mala yê derewîn. Li derîyê wan dixe. Lawikek dertê ber derî. Mêrik dibêje:

-Ma ev der mala filankes e?

-Belê apo, ez jî kurê wî me, te çi divê?

-Wele qet hema min got ez bibînim.

-Fermo derbasî hundur be apo.

-Ma qey bavê te ne li malê ye?

-Na apo.

-Êê, kuda çûye?

-Welle li wê taxê tîşek bi 'ewrekî ketîye, çûye bi hev ve bidirû, ewê nuka were..!

Mêrik ecêbmayî dimîne û ji xwe re dibêje: "wey xwelî li serê min û bavê min be, hela tu li kurê wî binêre, kî çi zane bavê wî çawa ye?"

Institut kurde de Paris

## HERDU JÎ NIKANIN

Pîremêrek bi rê de diçe, dinêre ku zarokekî biçûk li ber dîwarekî rûniştîye û digrî. Pîremêr xwe nêzîkî wî dike û dipirse:

-Tu çima digrî kurê min?

Kurik:

-Ez jî dixwazim wekî xortan bijîm lê nabe.

Pîremêr jî dest bi girî dike û dibêje:

-Ax kurê min ax, ez jî dixwazim wekî wan bijîm, lê nabe!



Institut kurde de Paris

## JI BO KEVN NEBE!

Rojekê gundîyekî Cilînî ji xwe re baweşîngekê dikire. Ji bo ku baweşînga wî kevn nebe, baweşîngê li ba nake, lê baweşîngê digre dide ber ruyê xwe û serê xwe li ba dike!



## WERE, LÊ NE BI ŞEV


Dizek li mahkemê tê berdan. Diz diçe buroya abûqatê xwe daku sipas bike ku hewqasî alîkarîya wî kir û ji abûqat re dibêje:

-Ez gelekî sipasî te dikim, her çi wexta tu bixwazî di xizmeta te de me.

Abûqat:

-Her wext derîyê min ji te re vekirîye, lê ji kerema xwe re bi şev neyê!

Institut kurde de Paris



## FÎL Û KURMORÎ

Rojekê Fîl û Kurmorî diçin sînemayê.

Fîl:

-Ger bavê min were û min li vê derê bibîne wê pir bixeyide.

Kurmorî:

-Netirse, wexta ku bavê te hat, tu xwe li pişt min veşêre!



## GER ÎSPAT BIKE

Mêrikekî amerîkayî li gel jina xwe dixwazin biçin Meksîkayê. Tên ber derîyê sînor, polîs li pasaportên wan dinêre û vedigere ser mêrik û dibêje:

-Pasaportên we temam in, lê gelo ezê çawa bizanibim ku ev jina te ye, divê tu îspat bikî.

Mêrikê Amerîkayî:

-Ax polîs efendî ax, xwezîka te bikarîba îspat bikira ku ne jina min e, bawer bike minê hezar dolar bida te!

Institut kurde de Paris

## JI RIHA XWE JÎ FEDÎ NAKÎ

Melle dersê dide şagirdên xwe. Ji şagirdan yek dixwaze avê vexwe. Diçe li cerê avê dinihêre, şiklê xwe tê de dibîne, ditirse, yekser tê cem Mellê û dibêje:

-Mellê min, merivek ketîye nava cêr.

Melle tê li hundurê cêr dinihêre ku şiklê mirovekî tê de ye û dibêje:

-Kuro, ma tu mestî mezin î, ma tu ji wê riha xwe jî fedî nakî, tu vî zarokê biçûk ditirsînî?



**BILA ÇAR PERÇE BE!**

Merivek li aşxanê pîzzayekê dixwaze.

Pîzzacî:

-Ez pîzza te bikim çar perçe yan heşt perçe?

Meriv:

-Heşt perçe pirr e ez nikarim bixwim, bila çar perçe be!

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE




**WÊ JI KÊFA BIMIRE**

Elî:

-Ero tu hez dikî ku nuha xeberek were ku xesûya te mirîye?

Hesen:

-Na, çimkî wê wextê ezê jî ji kêfa bimirim!



**EZÊ TÎMSEHEK DIN JÎ BIKUJIM...**

Jina mirovekî zengîn ji mêrê xwe cotek solên ji çermê tîmsehan xwest. Mêrik jî got "bira be, ezê ji te re peyde bikim" û rabû çû Afrîkayê nêçîra tîmsehan. Nêzî 20 tîmseh kuşt şûn de, êdî aciz bû û ji xwe re got:

-Ezê tîmsehek din jî bikujim, eger ew jî bê sol (pêxwas) be, êdî ezê dev jê berdim!

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**WEXTA KU EZ JÎ AWÛQAT BÛM...**

Li buroya awûqat, piştî 15 deqqeyan kalorîfercî ji abûwat re:

-Kalorîfera we temam e, êdî ewê baş kar bike, deynê we jî 200 dolar e.

Awûqat metilmayî dimîne û dibêje:

-Ger weha be heqê xebata te ya saetekê dike 800 dolar ku ez bi xwe bi vê awûqatîya xwe nikarim di saetekê de hewqas pere qezenc kim.

Kalorîfercî bi dilekî rehet û sakîn weha dibêje:

-Belê welleh heqê te heye, çimkî wexta ku ez awûqat bûm min jî hewqas qezenc nedikir!



Institut kurde de Paris

**FEYDA ZIMAN**

Mişkek û çêlikên xwe li derve digerîyan. Bi carekê de çavê wê li pisikekê ket. Mişkê dest pê kir 'ewtîya.

-'Ewt 'ewt 'ewt!

Gava ku pisîkê 'ewtîna wê bihîst, got qey kuçik e, ji tirsa ji wê derê revya.

Mişkê jî ji çêlikên xwe re weha got:

-Yaaa zarokno, we jî bi çavên xwe dît ku çiqas bi feyde ye ku meriv bi zimanekî biyanî bizanibe!



Institut kurde de Paris

**DI POKERÊ DE QEZENC KIR!**

Mudirê hepsê ji gardîyan dipirse:

-Êêê, hela bibêje çawa mahkûm revîya?

Gardîyan:

-Kilîta wî hebû!

Mudir:

-Qey ji we dizîbû?

Gardîyan:

-Na mudirê min, di pokerê de qezenc kir!



Institut kurde de Paris

**DEST NEDE TIRÎYAN...**

Amerîkayîyek li ser dikana meywefiroş zebeşekî digre û nîşanî meywefiroş dide û dibêje:

-Ma sêvên we yên herî mezin ev in?

Meywefiroş:

-Ji kerema xwe re destê xwe pirr nede tirîyan wê bihellisin!



**EYNÎ WEK YA GUNDÊ ME YE**

Yekî Cilînî diçe gundekî, êvar e lê hîvron e. Mêrikê Cilînî weha li hîvê dinihêre, paşê ji gundîyan re weha dibêje:

-Çi hîveke we ya rohn heye, eynî mîna ya gundê me ye.



**DAXWAZA YAHUDÎYEKÎ JI XWEDÊ!**

-Hoo Xwedêo, daxwaza min ji te bila ez nezewicim. Ger zewicîm bila jina min, min nexapîne, ger xapand bila haya min jê nebe, ger haya min jê bû jî bila haya xelkê jê nebe, ger haya xelkê jî jê bû bila ji min re nekin ser hevde, ger bikin jî ez ji xwe re nekim derd!

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**WÊ DÎSA VEGERE...**

Jinikê dev ji mêrik berdabû çûbû mala bavê xwe. Roja din mêrik li qahwê bi hevalekî xwe re rûniştîye, wecê wî tehl bûye hema hema dike ku bigirî. Hevalê wî:

-Şerm e lo, çi bûye tu hewqasî li ber dikevî, ma hema çûye bila biçe, ma qey jin nemane li dunyê!?

Mêrik:


-Ez qet jî li ber çûyina wê nakevim!

Hevalê wî:

-Lê çi ye te weha xwe perîşan kirîye?

Mêrik:

-Têlgiraf şandîye wê dîsa vegere!



Institut kurde de Paris

**YÊ SOR MABÛ MIN NEXWEST!**

Yekî serrût û yekî ser bi pûrt ê porsor li qahwê rûniştine. Yê porsor ji yê serrût re dibêje:

-Ero wexta ku Xwedê por bela dikir tu li ku bû?

Serrût:

-Ez piçekî dereng hatim ji ber wê jî porê reş qedyabû, tenê yê sor mabû, ew jî min nexwest!




Institut kurde de Paris

**ÇAY DI XWELÎDANKÊ DE**

Li qahweyekê li ser dîwar nivîsek weha hatibû nivîsîn:

"Ger hûnê cixara xwe di qedeha çayê de vemirînin, ji kerema xwe re bibêjin em çaya we jî di xwelîdankê de bînin."




## ÇIMA YÊ EREBAN BI SED DOLARÎ YE?

Li bazarekê mêjîyê însanan difroşin. Li ser hemû babet mêjîyê milletan fîyeta wan jî nivîsîne:

Mêjîyê Yahudîyan..........1 Kg=2 Dolar
Mêjîyê Amerîkayîyan...1 Kg=2 Dolar
Mêjîyê Rûsan.................1 Kg=3 Dolar
Mêjîyê Almanan.............1 Kg=2 Dolar
Mêjîyê Kurdan...............1 Kg=4 Dolar
Mêjîyê 'Ereban..............1 Kg=100 Dolar


Kurdê me wexta ku li vê tabloyê dinihêre ecêbmayî dimîne û piçekî jî diqehere, diçe ji dikandar dipirse:

-Ma çima mêjîyê Ereban hewqas buha ye, ma çi yê Ereban ji milletên din zêde ye?

Dikandar:

-Birako, ma tu zanî heta ku em kîloyek mêjîyê Ereban bi dest xin, bi kêmanî em serê 100 kesê Ereb jê dikin!

Institut kurde de Paris



**ELÎYÊ XEMXUR**

Elî mirovekî welê bû ku her tişt ji xwe re dikir derd. Gelek li ber êş û kul û derdên xelkê diket. Ji ber wê jî xelkê jê re digot Elîyê Xemxur.

Şevek havînê ye, Elî û jina xwe li ser xanî radizên. Elî ji xwe re dibêje "Hoo Xwedêyo, şukur ji te re ku îşev ezê bê derd û xem razêm!"

Hema di wê gavê de cîranê wan ban dike:

-Apê Elî ma te bihîstîye kera filankeso zaye, jê re dahşikek bê terî (dêl/dûvik/qemçik) çêbûye!

Elîyê Xemxur:

-A ji te re ha, dîsa derdan da ser derdan, de were xema nexwe. De nuka ew dahşika reben wê mezin be, wê ji xwe re here nava hevalên xwe bigere û biçêre û gava ku mêş li ser wan vene, hevalên wî hemû wê bi terîya xwe mêşan biqewitînin, ev dahşika rebena bê terî wê çawa bike?

Institut kurde de Paris



**AXAYÊ MIN BÛYE BÎSTAN**

Axayek nexweş dikeve, ji xulamê xwe re dibêje:

-Kuro here ba hekîmekî, bêje zû were axayê min nexweş e.

Xulam:

-Baş e axa, lê ger hekîm nexweşîya te bipirse ez çi bibêjim jê re?

Axa:

-Hema bibêje serê axayê min werimîye bûye wekî kundiran, poz werimîye bûye wekî gizêran, dest werimîne bûne wekî xiyaran, ling werimîne bûne wekî balcanan, zik werimîye bûye wekî zebeşan...!

Xulam:

-Axayê min ê delal, ma hewqas tiştî ezê çawa di heşê xwe de bigrim, hema gotina kurt ezê ji hekîm re bibêjim "Hekîm zû were axayê min bûye bîstan!"

Institut Kurde de Paris
INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·



**MÊR MÊRAN NAS DIKE!**

Heso li nav gundîyan got:

-Hun dizanin li vî gundî du mêrxas hene, yek jê lawê apê min Şêxo ye.

Gundîyan yê din meraq kirin û jê pirsîn:

-Baş e yek ji wan Şêxo ye, lê yê din kî ye?

Heso got:

-Ez nabêjim, de wîya jî hun tê derxin!

Gundîyan li hevudu nihêrtin, ji hev pirsîn, kesî nikarîbû tu bersivek bida. Şêxoyê pismamê Heso xwe avêt pêş û got:

-Ez dizanim, ê din jî Heso ye!

Heso got:

-Lêêê, we dît çawa mêr mêran nas dike!!!

Institut kurde de Paris



## HESO BÛ HESEN EFENDÎ

Heso satilek mastê xwe digre davêje ser serê xwe daku here bajêr bifroşe. Heso bi rê de him dimeşe û him jî ji xwe re xeyalan çê dike û dibêje: "Ezê mastê xwe bifroşim, bi perê mast ezê cotek berx bikirim, ezê wan xwedî bikim, ewê mezin bibin, bizên, ezê wan berxan jî xwedî bikim, ewê jî mezin bibin û bizên, hînga wê bibin şeş pez, şeş ê bibin donzdeh, donzdehê bibin bîst û çar...wê bibin çil û heşt...sed...dused...Ezê pir zengîn bim. Wê wextê her kesê ji min re bibêje Hesen Efendî û ewê weha serê xwe li ber min xwar bikin." Heso wexta ku serê xwe xwar dike, satila mast bi ser de dirje, herder wî dibe mast. Heso weha li halê xwe mêze dike û dibêje: "Her kesê ji min re bibêje Hesoyê ser bi mast!"

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**ÇIVÎKÊN BI PÛSÛLE Û XERÎTE**

Mamoste ji telebeyên xwe re dibêje:

-Çi tiştekî 'ecêb e ku ev çivîk û teyrên dunyê hemû bê pûsûle û bê xerîte çawa dikarin bifirin biçin heta Afrîkayê. Ma ne wilo ye?

Telebeyek:

-Ma gelo wê ne 'ecêbtir baya ku bi pûsûle û xerîte biçûyana...!?



**MUŞTERÎYÊ WÎ SAX BÛYE**

Doktor ji hevalê xwe re dibêje:

-Qet nepirse, min muşterîyê xwe yê herî baş wenda kir.


Hevalê wî:

-Çima, qey mir?

Doktor:

-Na, baş bûye êdî nexweş nakeve!

Institut kurde de Paris




**EZÊ DÎSA BIBÊJIM BAVO**

Yek ji yekî dipirse:

-Ger bavê te bibe serokwezîr, tu yê çi bibêjî jê re?

-Ezê dîsa bibêjim bavo!



Institut Kurde de Paris

**JI BO GUHERTINA LAMBEYEKÊ...**

Yek ji yekî dipirse:

-Ger li daîreyeke resmî lamba odeyekê bişewîte, ji bo guhertina wê lambeyê çend burokrat lazim in?

-50 burokrat!

-Çima?

-Yek ji wan wê lambê biguherîne, 49 burokratên din jî wê kaxidên resmî yên ji bo guhertina lambeyê binivîsin!



Institut kurde de Paris

**TUYÊ BIBÎ ÇI?**

Mamoste ji telebeyekî xwe dipirse:

-Tu mezin bî, tu yê bibî çi?

-Ezê alîkarîya bavê xwe bikim!

-Ma bavê te çi karî dike?

-Bi mîrasa kalkê min dijî!



Institut kurde de Paris

**MÊRÊ MIN GOT**

Jinikek ji jinikek din dipirse:

-Ma tu û Rizgo hîn bi hev re dimînin.


-Na welle me dev ji hev berda!

-Çima?

-Ez xapandim, jina wî heye ji min re nedigot!

-Tu ji ku dizanî jina wî heye?

-Mêrê min got!



Institut kurde de Paris

**KARÊ DU DEQÎQEYAN**

Li oda doktorê diranan, nexweş ji doktorê diranan dipirse:

-Hun diranekî bi çi dikşînin?

-150 Dolar!

-Çiii...! 150 Dolar, ji bo karê du deqîqeyan!?

-Ger tu bixwazî ez dikarim dî nîv seetê de jî bikşînim!



Institut Kurde de Paris

**DI DERBEKÊ DE 15 NAN**

Gundî giş li hev rûniştine. Yekî rîsipî ji gundîyan dipirse:

-Gelo merivek dikare çend nanan bixwe?

Gundîyekî xort hema xwe davêje pêş û dibêje:

-Apo, ez dikarim di derbekê de panzdeh nanan bixwim!

Rîsipî:

-Kuro ez behsa mirovan dikim, ne ku dewar!



**DI DEWSA GÛZ DE ZEBEŞ BIKETA**

Şivanek diçe nav bîstanekî, ji xwe re zebeşekî digre û tê bin dara gûzê rûdine zebeşê xwe dixwe. Pişt re xwe li bin darê dirêj dike. Li gûzên darê mêze dike û ji xwe re dibêje:

-İşê Xwedê çi ecêb e, anîye van gûzên biçûk bi vê dara mezin ve kirîye, van zebeşên mezin jî bî van lemên ziravên erdê ve kirîye.

Ji jor de gûzek ji darê tê li serê wî dikeve, serê wî diêşe. Mêrîk destê xwe datîne ser serê xwe û dibêje:

-Welleh Xwedê baştir zane ew çi dike, eger di dewsa vê gûzê de zebeş baya minê çi bikira!

Institut kurde de Paris



**EZ NE JI VÎ GUNDÎ ME**

Şev e, rêwîyek di gundekî re derbas dibe. Dinihêre ku du dîn li hîvê mêze dikin û munaqeşe dikin. Yek dibêje "roj e" yê din dibêje "na, hîv e." Gava ku mêrik dibînin dibêjin "bise em ji vî camêrî bipirsin."

Mêrikê rêwî li wan dinihêre û jî xwe re dibêje "ezê nuha çi bibêjim, her du jî dîn in." Piçekî difikire, paşê weha dibêje:

-Welleh birano, ez ne ji vî gundî me!

Her du dîn:

-Wê wextê tu nizanî, de bi rîya xwe de here!



Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris

**DIYA XWE JÎ BI XWE RE BIBE**

Bav ji keça xwe re dibêje:


-Mêze keça min, Ahmedê lawê filankes dixwaze bi te re bizewice, do êvarê ji min re got, min jî qebûl kir, îcar tu çi dibêjî?

Keçik:

-Na bavo ez naxwazim, ma ezê çawa dîya xwe bi tenê bihelim, ez naxwazim ji dîya xwe veqetim!

-Tişt nabe keça min, dîya xwe jî bi xwe re bibe!

INSTITUT KURDE de PARIS
• BIBLIOTHÈQUE •



Institut kurde de Paris


**TELGRAF NEGIHÎŞTÎYE**

Mêrik derdê xwe jî dîya xwe re dibêje:

-Dayê, ma ev çi ye bi serê min de hat, ji bo mehekê ez çûbûm bajarekî din berîya ku ez vegerim malê min têlgirafek jî ji jîna xwe re şand ku vaye ez têm, lê roja ku ez vegeryam malê ez çi bibînim, ew û mêrikek di nava nivînan de ne. De ka bêje dayê nuha ez çi bikim?

Dîya wî piçekî sekinî paşê got:

-Piçekî bêhna xwe fireh ke kurê min, neqehere, belkî têlgrafa te dereng gihîştibe destê wê!



Institut kurde de Paris

**JI MIN RE JÎ BIBÊJE**

Du heval rastî hev hatin. Yekî halê yê din pirsî:

-Êêê, çawayî, baş î, zarok çawan in, malbata te çawa ye?

-Zarok baş in, lê ev serê sê mehan e ku jina min bi min re deng nake!

-Çima?

-Sê meh berê me munaqeşe kir, ez qeherîm min gotinek ne baş jê re got, li ser wê ew jî ji min xeyidî, êdî bi min re deng nake.

-Ez ketime bextê te, çi dibe wê gotina ne baş ji min re bibêje!



Institut kurde de Paris

**BILA YEK BA, BILA MÎNA TE BA**

Mîrê Hekkarîyan ji jineka xwedîyê heft zarokan pirsî:

-Zaroyên te çawan in?

Jinik:


-Bila Xwedê canê wan bistîne!

Mîr 'ecêbmayî ma û lê vegerand:

-Heft kurên te hene, tu çima wilo dibêjî?

Jinik:

-Bila yek ba, bila mîna te ba!



**BARÊ KERA TE ÇI BE EWÊ DÎSA WÊ BIBE**

Merivekî Apê Leto dixwaze here zîyaretîya Apê Leto, li kera xwe siwar dibe û berê xwe dide gundê wan. Gava ku tê ber mala wan, ji kera xwe peya dibe û dest pê dike li kera xwe dixe. Apê Leto derdikeve der û dipirse:

-Kuro ma xêre çi ye tu li wê kera reben dixî?

Mêrik:

-Apê Leto, tu zanî wexta em ji malê derketin min xwest ez ji te re hinek tişt wek dîyarî bînim, lê a vê kera hanê nehişt, yan na ez dest vala nedihatim.

Apê Leto:

-Tiştek nabe kurê min, qet xeman nexwe, barê kera te çi be ewê dîsa wê bibe!

Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris


**KOR Û JINA XWE**

Jinikek ji mêrê xwe yê kor re dibêje:

-Mêro, ax nuha çavên te bidîtana ku ez çiqas xweşik û çiqas ciwan û delal im!

Kor:

-Erê jinê, çavên min nabînîn lê ma qey hişê min jî tuneye, ma heger tu welê xweşik û ciwan bûya te qet dihat min dikir!?



Institut kurde de Paris

**GARIS Û WERÎS !**

Yek diçe mala yekî werîs dixwaze. Xwedîyê malê naxwaze werîsê xwe bidê, dibêje:

-Birako me garis li ser werîs raxistîye!

Mêrik:

-Çawa dibe, qet hatîye dîtin ku garis li ser werîs were raxistin?

Xwedîyê werîs:

-Belê dibe, gava ku dil nexwaze garis jî tê raxistin, genim jî!



**FÎNCANA QAHWÊ**


Mamoste ji telebeyekî xwe re dibêje:

-Hela kanê ji min re rismê fincanek qahwe çêke, tu dikarî?

Telebe:

-Belê mamoste dikanim, lê bila tahl be yan şîrîn be?

Institut kurde de Paris



**ÇI LI DORA DUNYÊ DIGERE?**

Mamoste ji telebeyên xwe dipirse:

-Baş e, dunya li dora rojê digere, lê çi li dora dunyê digere?

Telebeyek:

-Tûrîst!



**JINA WÎ DU ZAROK ANÎNE**

Memûr ji mudirê xwe îzin xwest, ji ber ku jina wî yê biwelide. Mudir du roj îzin da memûr. Memûr piştî çar rojan hat kar. Mudir jê pirsî:

-Min du roj îzin dabû te, tu çar rojan nehatî, çima?

Memûr:

-Belê mudirê min, lê jina min du zarok anîn!




**MÊR HEMÛ DÎN IN**

Jinik ji mêrê xwe re dibêje:

-Li dunyê çiqas mêr hene hemû dîn in!

Mêrik:

-Na xanim, ne hemû, tenê yên ku jin anîbin dîn in.



Institut kurde de Paris

**DU KOR**

Du kor dipeyivîn.

-Min bihîstîye ku tu dikî keça xwe bizewicînî.

-Belê min jê re xortekî lihevhatî û qenc dîtîye.

-Baş e, te ji xelkê pirsî, hal û hewalê wî çawa ye?

-Na, lê gava ku çavê min pê ket, hema min di cî de ew eciband.

## HESP Û KOŞK

Yekem:

-Koşka me welê bilind e ku serê wê digihîje ser ewran.

Duwem:

-Hespekî me heye welê mezin e, wexta ku mirov lê siwar dibe dengê melegên esmanan tê mirov.

Yekem:

-Hespê weha li ku hatiye dîtin, baş e hûn çawa lê siwar dibin?

Duwem:

-Ji bo ku em bikaribin lê siwar bin, em derdikevin ser banê koşka we!

Institut kurde de Paris



## SILAVAN LI MIHEMMED BIKE

Mêrikek nêt kir biçe hecê. Bi rê ket çû. Bi rê de rastî hevalekî xwe hat û jê re got:

-Ez diçim hecê, ma daxwazîyek tę heye?

Mêrik:

-Silavan li Mihemmed bike!



Institut kurde de Paris

**LI ESKERÎYÊ QIYMETA JINÊN AVIS**

Du hevalan derheqê eskerîya jinan de xeber didan.

-Gelo rast e li eskerîyê qiymeta jinên avis bêtir e?

-Belê, me'aşê wan jî zêdetir e.

-Sebeb çi ye?

-Carekê kampek eskerî teslîmî jinan kiribûn ku hinek ji wan avis bûn. Dijmin êriş bir ser vê kampê. Bû teq û reqa tifingan. Ji ber vê teq û reqê, jinên avis zan û ji hemûyan re kur çê bû. Van kurana nihêrtin ku dîyên wan di halekî xerab de ne, hema tifingên dîyên xwe girtin û êrişî dijmin kirin. Eskerên dijmin pir li ber xwe nedan, bi paş de revîyan.



**TE ÇIMA BERÊ NEGOT?**

Gundîyek li yekî xwende digerya. Rastî efendîkî hat û jê pirsî:

-Tu dizanî bixwînî?

Efendî:

-Ma çawa nizanim!

Gundî rabû kaxezek dayê. Efendî kaxez girt û lê nihêrt paşê dest bi xwendinê kir: "Berî ku dest pê bikim silavan li we dikim, têm destê dayê, bavo çawa ye, pez çawa ye, çêreya îsal çawa ye, baran dibare yan na, li vê derê dunya sar e......"

Gundî:

-Efendî tu şaş dixwînî, tiştê ku di destê te de ye mektûb nîne, sened e sened!

Efendî:

-Te çima berê negot, ma te berê bigota min ê jî çewt nexwenda!

Institut kurde de Paris



## LEQEBA WÎ GUHERTIN

Li gundekî mirovek hebû, jê re digotin Ehmedê Ker. Jina mêrik ji vê leqebê gelek aciz dibû. Rojekê ji mêrê xwe re got:

-Rabe berxekî serjêke, muxtar û giregirên gund biezimîne malê û vê leqeba pîs bide guhertin.

Mêrik mîna jinikê got kir. Mêvanan piştî xwarin û vexwarinê ji mêrik re gotin:

-Me leqeba te guhert, ji vê û şûn de emê ji te re bibêjin Ehmedê Dahşik.

Mêrik bi kêf û eşq bazda alîyê malê û gote jina xwe:

-Jinê mizgîna min li te leqeba min hat guhertin, ji vira şûn de navê min Ehmedê Dahşik e!

Jinik:

-Ji dil tu ker î, ma tu nizanî ku dahşik gava mezin dibe, dibe ker!

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**HEJMAR JÎ BUHA BÛNE**

Tacirekî êvarî deftera xwe anîbû malê, hesabên xwe çêdikir.

Kurikekî tacir hebû, di sinifa pêncan de bû. Tacir dema ku hesabên xwe çê dikir, ji kurê xwe pirsî:

-Pênc caran heşt dikin çend?

Kurik;

-Çil û pênc!

Tacir:

-Subhanellah, hejmar jî buha bûne, berî şer çil bûn.



**ÇEND STÊR LI ESMAN HENE**

Gundîyek ji Melayê Meşhûr dipirse:

-Gelo çend stêr li esman hene?

Mele:

-Ger çend mû li ser dêla (dûv/poç) kerê min hene, hewqas jî li esman hene!

Mêrikê gundî metilmayî dimîne û dibêje:

-Ma çawa dibe Mele?

Mele:

-Heger tu bawer nakî, bijmêre!

Institut kurde de Paris



**KER NE LI MAL E**

Rojekê gundîyek diçe mala melê gund û dibêjê:

-Mele xêra mirîyên xwe kera xwe bide min ez pê biçim aş.

Mele:

-Welleh kurê min kera me ne li mal e.

Di wê navê de dengê zirrîna kerê ji axur tê.

Gundî:

-Kanê melle, te go ne li mal e, ev çi zirrîn e?

Melle:

-Ma tu ji min bawer dikî yan ji kerê!?

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE



**MALA XWEDÊ**

Şevekê li gund yek li derîyê yekî dixe. Xwedîyê malê dipirse:

-Ew kî ye?

Mêrik:

-Ez ji filan gundî me, mîvanê Xwedê me, min qebûl bikin.

Xwedîyê malê ji ber ku naxwaze mîvanan biezimîne, derî vedike û dibêjê "li dû min were" û wî dibe ber derîyê mizgefta gund û jê re dibêje:

-Fermo mîvanê Xwedê, mala Xwedê ev e!

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**HEMA BÊJE BÎST**

Yekî Cillînî ji yekî din dipirse:


-Birako saet çî ye?

Mêrik li şûna ku bibêje saet dehan deh dibuhure, dibêje:

-Deh û deh.

Yê Cillînî:

-Pa qey em ehmaq in, ma hema bêje bîst!



**XWEDE BIDE**

Mêrikek xanîyê xwe lox dike. Feqîrek di wir re derbas dibe û ji mêrik re dibêje:

-Ji kerema xwe re tu dikarî dakevî jêrê, ezê tiştekî ji te re bibêjim.

Mêrik dadikeve jêrê.

Feqîr:

-Ji bo Xwedê sedeqakê bide min!

Mêrik diqehere lê qet dengê xwe nake, dîsa derdikeve ser xanîyê xwe û ji feqîr re dibêje:

-Ji kerema xwe re were jorê.

Feqîr bi kêfa ku wê sedeqakê bigre derdikeve jorê. Mêrik jê re dibêje:

-Xwedê bide!

Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris


**BI TE RE DENG NAKIM**

Du heval rûniştine, yek ji êdin re dibêje:

-Bi serê te ta'ma jîyanê nemaye, ezê xwe bikujim.

Yê din:

-Bi Xwedê eger tu xwe bikujî, êdî ez qet bi te re deng nakim!



Institut kurde de Paris

**DI NABÊNA KER Û KURD DE ÇI HEYE?**

Dema Osmanîyan de Tirkek dibe walîyê Diyarbekirê. Miftîyê Diyarbekirê jî Kurdekî xweşsuhbet bûye. Rojekê li meclîsa walî civat hemû rûniştîne. Walî û Muftî jî li kêleka hev li ser doşekekê ne, di nabêna wan de jî balîfek heye. Walî ji muftî re dibêje:

-Miftî efendî bi rastî di nabêna ker û Kurd de çi heye?

Muftî dibişire û bi nermî dibêje:

-Walî efendî, bi qasî ku ez dibînim, di nabêna ker û Kurd de tiştekî pir piçûk heye ku ew jî balîfek e!



Institut kurde de Paris

**HEMALÊN WAN JÎ BI ÎNGILÎZÎ ZANIN**

Ronakbîrekî Tirk diçe Londrayê. Piştî ku vedigere tê Îstenbolê, heval û hogirên wî jê dipirsin:

-Êêêê, Londra bajarekî çawa ye?

Ronakbîr:

-Ez çi bibêjim, bajarekî welê medenî û pêşketî ye ku hemalên wan jî bi îngilîzî dizanin!



**QET MESEKINE**

Kur û bav qise dikin. Kur:

-Bavo, diya min bi qisê min welê dikene ku carna ji min re dibêje "bese ezê ji kena bimirim".

Bav:

-De kurê min ha, hema tu jî qet mesekine hertim bipeyive!



**DU BABET JIN**

Yek ji yê din dipirse:

-De ka bibêje çend babet jin hene?

Yê din:

-Du babet; yek ji wan her tim qise dike, ya din jî qet devê wê nasekine.

Institut kurde de Paris



**DI SALEKÊ DE ÇEND ROJ HENE**

Mamoste ji telebê xwe dipirse:

-Di salekê de çend roj hene.

Telebe:

-Heft roj.

Mamoste:

-Na, kurê min ez ji te hefteyekê napirsim, ez dibêjim di salekê de çend roj hene?

-Belê mamoste, min fam kiriye, di salekê de heft roj hene.

Mamoste:

-Çawa dibe kurê min, qey te xwe şaş kirîye!

Telebe dest pê dike dijmêre:

-Duşem, Sêşem, Çarşem, Pêncşem, Înnî, Şemî, Yekşem bûn heft roj, de ka bibêje mamostê minê delal, ma bêyî vana tu rojek din heye!

Institut Kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE •



**SEDEMÊ GIRÎNÊ**

Kurikekî biçûk li kuçê digirya. Pîrejinekê jê pirsî:

-Tu çima digrî kurê min?

Kurik:

-Diya min dolarek dabû min, min wenda kir, ez digerim nagerim nabînim.

Pîrejin:

-Tiştek nabe kurê min, a ji te re dolarek din, de megrî.


Kurik dolarê digre, lê dîsa dest bi girî dike û hem jî hîn bêtir. Pîrejin ecêbmayî dimîne û jê dipirse:

-Ma îcar tu ji bo çi digrî?

Kurik:

-Ger min ew dolara xwe wenda nekira, nuha perê min dibûn du dolar!

Institut kurde de Paris



**ROJEKÊ BILÎZE ROJEKÊ NA**


Yekem:

-Di qûmarê de şansekî min î ecêb heye, rojekê dibim, rojekê didim.

Duwem:

-Ê tu jî rojekê bilîze, rojekê melîze!

Institut Kurde de Paris



**BERSIV ZOR E**

Di îmtihanê de Memo nikare tu tiştekî binivîse. Kaxeda vala dide mamostê xwe. Mamoste jê dipirse:

-Pirs zor û zehmet bûn qey?

Memo:

-Na wele mamoste pirs hêsan in, lê bersiva wan zor e!



Institut kurde de Paris


**GER CEBILXANE BITEQE**

Li eskerîyê çawîşek ji eskerekî dipirse:

-Ger cebilxana ku tu li berê nobedar î biteqe tu yê çi bikî?

Esker pêşî piçekî difikire, paşê dibêje:

-Ezê debança xwe derxim û carekê bi hewa de biteqînim daku herkes bibihîze.



## QIJIKA XWENDE


Qijika reş li ser darekê veniştîye û perçeyek penêr jî di devê wê de ye. Rovî di wir re derbas dibe, çavê wî li penêr dikeve, şorika wî tê xwarê. Hema bi dengekî nazik ji qijikê re dibêje:

-Demek dûr û dirêje ku min dengê te yê xweş û zelal nebihîstîye, çi dibe hela ji min re sitranekê bibêje.

Qijik pêşî penêrê di devê xwe de dixwe paşê jî vedigere ser rovî û jê re weha dibêje:

-Birayê rovî, min ev çîrok xwendîye, here ji xwe re li qijikek nexwende bigere.

Institut Kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**MASÎ ÇIMA NAPEYIVIN?**

Mamoste telebeyên xwe îmtihan dikir, îmtihan bi devkî bû. Piştî gelek pirsên cihê cihê, dor hat pirsên li ser heywanên avê. Mamoste pirsî:

-De ka bibêjin, masî çima nikarin bipeyivin?

Telebe hemû mit û mat man. Ji tu kesî dengek derneket. Piştî qederekê ji telebeyan yekî zîrek destê xwe bilind kir û got:

-Mamoste, ger yek serê te jî têxe binê avê, ma tuyê bikaribî bipeyivî!?




Institut kurde de Paris

**GER PARAŞUT VENEBE**

Mêrik li dikana paraşutçî ye, dixwaze paraşutekê bikire. Paraşutekê di'ecibîne, paşê ji dikandar dipirse:

-Baş e, wexta ku ez xwe ji tiyarê bavêjim û ev paraşuta venebe ezê çi bikim?

Dikandar:

-Wê wextê bîne emê biguherin!



**MINÊ JI KAR BIAVÊTA**

Li eskerîyê tedrîba sibê ye. Hemû esker ketine rêzê direvin. Yek ji eskeran bi dizî ji hevalên xwe vediqete û diçe binê darekê xwe dirêj dike daku hinekî bêhna xwe vede. Lê qomutan wî dibîne û tê cem wî û jê dipirse:

-Berîya ku tu werî eskerîyê te çi kar dikir?

Esker:

-Dikana min hebû, ez terzî bûm.

Qomutan:

-Karkerên te jî hebûn?

Esker:

-Belê hebûn.

Qomutan:

-Baş e, heger karkerekî te ji kar birevîya û te jî ew bigirta teyê çi bikira?

Esker:

-Minê derhal ew ji kar bavêta!

Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

**ÇEND MÊR KIRIYE**


Mêrik ji dîya xwe dipirse:

-Dayê Xwedê hebînî heta nuha te çend mêr kirine?

Dayik:

-Wîîî kurê min, ma ez li ku, mêr li ku, ma tu dibêjî qey çavê dîya te jî li mêra ketîye, tevîhev 13 ji Silîva, 12 ji mala kirîva, yek Emerê Guhşelte, yek jî rehmetîyê bavê te, çirtik-pirtikên mayî jî nayên bîra dîya te!

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE



## LI DORA HEFSÊ DÎWAR TUNEYE

Du kesên Cilînî dixwazin ji hefsê birevin. Yek ji yê din re dibêje:

-Eger dîwar bilind be emê hilkişin ser û xwe bavêjin alîyê din, heger nizm me wê wextê jî emê xwe di ser re çeng kin.


Yê din dibêje:

-Baş e, lê bisekine ez herim li dîwar binêrim.

Diçe dinêre ku li dora hefsê dîwar tuneye, lê têlên bi dirî hene, bê kêf tê ji hevalê xwe re weha dibêje:

-Wele welê xuya ye ku emê nikaribin birevin, cimkî li dora hefsê dîwar tuneye.

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**PEMPO DIXE DEV Û POZÊ WÎ**

Du jin bi hev re dipeyivin, yek ji ya din dipirse:

-Erê Xwedê hebînî, mêrê te jî bi şev xure-xurê dike?


-Belê hem jî pirr.

-Baş e tu çi bi kar tînî ji bo ku xure-xurê neke?

-Pembo.

-Yanî tu pembo dikî guhên xwe?

-Na, nakim guhên xwe, dixim dev û pozê wî!




## CARNA XWE DIZIVIRÎNE

Du jinik bi hev re qise dikin:

-Mêrê te her tim weha bi roj xwe dirêj dike û radikeve, ma qet tiştekî din nake?

-Na na dike, di xew de carna xwe dizivirîne alîyê din jî!



## XETAYÊ KÊ BÛ


Du erebe li hev diqelibin. Polîs ji şofêrê her du erebeyan dipirse:

-De ka bibêjin xetayê kê bû?

Ji şoferan yek:

-Welleh polîs efendî ez nizanim, çimkî wexta ku qeza bû, min li derek din mêze dikir!

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**DI POKERÊ DE HÎLE**

Çend kesan bi hev re pokêr dilîstin. Yê ku kaxet belav dikir ji yê qezenckirî re got:

-Tu hîleyan dikî!

Yê din bi ser de qeherî û got:

-Çi ye kuro, qey tu li maneya digerî, tu dixwazî çi bibêjî haa, hîleyê çi kuro, mêze tu zanî ha!?

Yê din:

-Na, yanê ez dixwazim bibêjim, kaxedên ku ez didim te tu bi wan nalîzî?



Institut Kurde de Paris

**ÇAVÊ XWE DERXE**

Çavê mêrikê gundî pir diêşe. Diçe cem Meleyê Meşhûr û dibêje:

-Eman hewar Mele, ez ketime bextê te, ji do êvar de ye çavê min diêşe, ez nizanim çi bikim!

Mele:

-Welleh birako ez jî nizanim çi bibêjim, lê par diranê min pir diêşiya min çû kişand, ez jê xelas bûm, bi min tu jî here çavê xwe derxe ji wê êşê xelas be!



Institut kurde de Paris


**DI TARÎYÊ DE NIZANE**

Nîvê şevê ye, jina mêrikê Cilînî ji xew şîyar dibe. Tarî ye, dixwaze çirê vêxe. Ji mêrê xwe re dibêje:

-Heste li alîyê te yê rastê ye, ji kerema xwe re tu dikarî bidî min, ezê pê çirê vêxim.

Mêrik:

-Keçê ma di vê tarîyê de ez çi zanim alîyê min ê rastê kuder e!



**SEDHEZAR KES NIVÎSÊN WÎ DIXWÎNIN**

Mamoste ji teleba xwe re:

-Aferim ji te re, welê xuya ye tu yê bibî nivîskarekî pirr mezin, bi hezaran kes wê nivîsên te bixwînin.

Piştî gelek salan rastî hev tên.

Telebe:

-Mamoste gotina te rast derket, nuha ne bi hezaran lê bi sedhezaran kes nivîsên min dixwînin.

Mamoste:

-Baş e tu çi dinivîsî?

Telebe:

-Tabela dikanan!

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**KUMFIROŞ**

Gundîyekî Fransî di dema şoreşa Franseyê de ji bajarîyekî dipirse:

-Ero ji bajêr çi xeber heye?

-Welle hema her pevçûn û serbirrîn e.

-Çima serîyan dibirin, ma bira dest û nigan bibirin.

-Çima?

-Ma qey tu nizanî ku ez kumfiroş im!



Institut kurde de Paris

**NE BI ŞUŞTINÊ LÊ BI GUVAŞTINÊ**

Rêwîyek di ber malekê re derbas dibe mêze dike ku mêrikek pisika xwe dişo. Rêwî:

-Birayê delal pisikê meşo, yan na ewê bimire.

Mêrik:

-Na, na, tiştek jî pê nayê, bi lîfik û sabûnê xweşik dişom paqij dibe.

Rêwî roja din dîsa di wir re derbas dibe, dinêre ku pisik mirîye û dibêje:

-Ne min got wê bimire, te bi a min nekir!

Mêrik:

-Belê mir, lê ne bi şuştinê, gava ku min guvaşt mir!



Institut kurde de Paris

**KURSÎ BI DEST NEKETÎYE**

Hakim:

-Tu dibêjî herduyan jî bi kursîyan li hevxistine, baş e te çima ew ji hev nekirin daku şer nekin?

Şahid:

-Wele hakim efendî kursî bi dest min neket, yan na minê ew ji hev bikirana!



Institut kurde de Paris

**HEZ DIKE LI KERÊ SIWARBE**

Kurik ji diya xwe re dibêje:

-Dayê ez pir ji suwarbûna keran hez dikim, dixwazim li kerê suwar bim, çi dibe min li kerê suwar ke.

Jinik jî ji mêrê xwe re dibêje:

-Ji kerema xwe re vî kurikî piçekî hilgire, bide pişta xwe bira bêdeng be.



Institut kurde de Paris

**'UZRA JI QEBEHETÊ MESTIR**

Padîşahek ji wezîrê xwe re dibêje:

-Divê ku tu qebeheteke bikî û 'uzra xwe bixwazî ku 'uzra te ji qebeheta te mestir be!

Wezîr diçe malê, wê şevê kûr kûr difikire, lê tiştekî nabîne. Roja din tê qesra padîşah. Padîşah jê re dibêje:

-Îro dunya xweş e, were hem hilkişin jor ser banî.

Padîşah li pêş, wezîr jî li paş hildikişin jor. Gava diçin ser banî, wezîr destê xwe li qûna padîşah dixe. Padîşah bi hêrs dizivire û dibêje:

-Ev çi bû, wezîr?

-Wî padîşahê min tu yî? Bibexşîne, min got qey jina te ye!

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE



Institut kurde de Paris

**ŞERAB XWEŞIK DIKE**

Mêrik:

-Jinê tu zanî ku şerab mirovan pir ciwan û xweşik dike.

Jinik:

-Ez nizanim, min qet şerab venexwariye.

Mêrik:

-Ez zanim te venaxwariye, lê min pir vexwariye!



Institut kurde de Paris


**KU BAV QEBÛL NEKE**

Mamosta jin ji telebeyekî xwe diqehere û bi hêrs jê re dibêje:

-Axxx, xwezîka ez hefteyekê dayika te bûma, min zanîbû minê tu çawa terbîye bikira!


Telebe:

-Baş e, lê ku bavê min te qebûl neke?



**KÊM ZANIN, BAŞ FAM DIKIN**

Yek ji yekî din re dibêje:
-Tu zanî jin ji mêran bi aqiltir in.
Yê din
-Çima?
-Çimkî kêm zanin, lê baş fam dikin!



**DERPÊ FIRIKANDIYE**

Mêrikê Cilînî ji jina xwe re dibêje:
-Keçê te hevîr kir?
-Belê
-Ê te çi avêt ser hevîr?
-Derpîyê Kezîbanê!
-Ne Kezîbanê bi xwe de rî bû, derpiyê wê hemî bi gû bû!
-Belê, lê ziwa bû min firikand!

Institut Kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**ŞUKUR KARÊ WÎ HEYE**

Ahmed:

-Şukur ji Xwedê re nuha îşê te heye.

Azad:

-Belê, şukur ji Xwedê re!

-Êêê, tu li ku kar dikî?

-Di îşê xwe yê berê de.

-Çi îş e?

-Her dîsa wekî berê li dû kar digerim!



**NAXWAZE BIÇE BEHEŞTÊ**

Mamoste:

-Kî dixwaze biçe beheştê(cennetê)?

Bêyî Azad, hemûyê telebeyan destê xwe bilind dikin.

Mamoste:

-Azad te destê xwe bilind nekir, qey tu naxwazî biçî beheştê?

Azad:


-Belê, lê ez her tim guhdarîya bavê xwe dikim, çimkî her roj ji min re dibêje "piştî ku tu ji mektebê derket yekser were malê, nebe nebe tu li derekê bimînî."

Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

**ŞADTIRÎN JIN**
Mamosta jin ji telebeyan dipirse:
-Jina herî şad û kêfxweş kî ye?
Telebeyek:
-Hezretî Hawwa, çimkî xesûya wê tunebû!





Institut Kurde de Paris

**JI TIŞTEKÎ NATIRSE**

Bav li gel kurê xwe li baxçê heywanan digerin. Kurê wî dipirse:

-Bavo tu ji vî pilingî ditirsî?

-Na!

-Baş e lê ji vî şêrî?

-Na!

-Baş e, lê ji vî hirçî?

-Na!

-Babo, welê xuya ye tu tenê ji diya min ditirsî!



Institut kurde de Paris

**TÊXIM POZÊ KÊ?**

Dayik:

-Kurê min bes e tu tilîya xwe dixî pozê xwe.

Kurik:

-Baş e dayê têxim pozê kê?



Institut kurde de Paris

**EZÊ JÎ BIBIM TUCCAR**

Bav:

-Kurê min, ez her roj ji te re dibêjim, derewan meke, mêze tuyê mezin bibî, bibî derewîn, paşê tuyê çi bikî?

Kur:

-Ezê jî bibim tuccar!



Institut Kurde de Paris

**KURRÊ KERÊ**

Kur:

-Bavo ez kurrê kê me?


Bav:

-Kurrê min.

Kur:

-Baş e, çima diya min her roj ji min re dibêje kurrê kerê!

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE




Institut Kurde de Paris

**XWEDÎ MIRÎYE**

Hakim:

-Te çima otomobîla filankes dizî?

Diz:

-Welleh hakim efendî otomobîl li ber derîyê goristanê bû, min welê texmîn kir ku xwedîyê wê mirîye!



Institut kurde de Paris

**MAMOSTÊ DÎNDAR**

Kur:

-Babo tu zanî mamostê me mirovekî pir dîndar e.

Bav:

-Tu ji ku zanî?

Kur:

-Ê wexta ku ji me pirsan dipirse û em bersivê didin, hema dibêje "Allah, Allah!"



Institut kurde de Paris


**MAMOSTE PAQIJ DIKE**

Kurik her êvar gava ku ji mektebê tê malê, bavê wî li deftera wî dinihêre ku vala ye. Bav dipirse:

-Kurê min ez mêze dikim ku di deftera te de xeteke nivîsê jî tuneye, çima. Qey tu li mektebê tiştekî nanivîsî?

Kurik:

-Na bavo, welleh mamostê min çi li ser textê reş binivîse ez jî li deftera xwe dinivîsim, lê gava ku ew textê reş paqij dike ez jî deftera xwe paqij dikim!



Institut kurde de Paris

**YEK GA YE YEK KER**

Mêrik ji kurik pirsî:

-Tu ji bo çi digrî?

Kurik:

-Dîya min û bavê min şer kirin û bavê min ji dîya min re got "tu ker î"

Mêrik:

-Êêê?

Kurik:

-Dîya min jî jê re got "tu ga yî"

Mêrik:

-Baş e tu çima weha digrî?

Kurik:

-Ê ger yek ga û yek jî ker be, wê wextê ez çi me?



Institut kurde de Paris

**KER BETILÎYE**

Mêrikê Cillînî li kera xwe siwar bûye û çiwalê xwe yê tijî jî avêtîye ser pişta xwe. Yek jê dipirse:

-Ero te çima çiwal avêtiye ser pişta xwe?

Mêrikê Cillînî:

-Kera feqîr ji xwe di bin min de betilîye, qe nebe vî çiwalî jî ez hilgirim!



**BI ÇI DERKET ESMANAN**

Keşe dixwaze tinazên xwe bi mellê bike, dibêje:

-Melle gelo ev pêxemberê we wexta ku ji bo mîhracê çû esmanan, çawa derket jor?

Melle:

-Bi wê nerdiwana ku Hz. Îsa pê çûbû esmanan!

Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris

**MÎR MEZIN E YAN COTKAR?**

Gundîyek ji gundîyekî din dipirse:

-Gelo mîr mezin e yan cotkar?

-Bêguman cotkar, ger cotkar nebe mîrê ji ku genim bîne û nan bixwe!



Institut kurde de Paris

**A JI TE RE DESTMÊJA TE**

Apê Leto rojekê li ber çem destmêjê digre, piştî ku nigê xwe yê çepê jî dişo û tam li ser rabûnê ye, ferek sola wî dikeve avê û bi çem de diherike û diçe. Apê Leto her çendî dike ax û wax jî lê bê feyde ye. Ji qahra, ruyê xwe ji çem vedigerîne û tirrekê bi çem de dike û dibêje:

-Çemo, aha ji te re destmêja te, kanê fera sola min!

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE



Institut kurde de Paris

**KENGÎ DEST BI DEREWAN KIRÎYE**

Bav ji kurê xwe re dibêje:

-Qet tiştekî baş nîne ku mirov derewan bike, wexta ku ez di temenê(emrê) te de bûm min qet derew nedikir.

Kur:

-Baş e babo, tu çend salî bû te dest pê kir?



Institut kurde de Paris

**DI XEW DE DIAXIFE**

Jinik ji doktor re dibêje:

-Doktor efendî, mêrê min bi şev di xew de gelek diaxife, gelo ez çi bikim?

Doktor:

-Eger tu bi roj bihêlî biaxife wê wextê di xew de qise nake!



Institut kurde de Paris

**ŞEŞ HEZAR ŞAHID**

Hakim ji diz re dibêje:

-Tu dibêjî min nedizîye, lê binêre li vêderê şeş şahid hene ku bi çavên xwe dîtine ku te çentê jinikê dizîye.

Diz:

-Hakim Efendî şeş şahid çi ne, ez karim ji te re şeş hezar şahidan bînim ku qet yekî jî nedîye ku min dizîye!



Institut kurde de Paris

**BI ŞEV DIXWE BI ROJ RADIKEVE**

Yekem:

-Min û hevalekî me şert girtîye.

Duwem:

-Şertê we çi ye?

Yekem:

-Ezê panzdeh rojan xwarinê nexwim û panzdeh şevan jî ranekevim.

Duwem

-Çawa dibe?

Yekem:

-Pir hêsan e, ezê bi şev bixwim, bi roj jî rakevim!



Institut kurde de Paris

**NAFIROŞE**


Du kesên gelek dewlemend li ser dewlemendîya xwe fortên xwe didan:

Yekem:

-Ez welê dewlemend im ku ez karim dunyê bikirim.

Duwem:

-Lê ku ez nefiroşim!



Institut kurde de Paris

**YEK RISWA YEK REZÎL DIBE**

Rêbirek(mahkûm) li ser rê dixwaze rêwîyekî bişêlîne. Rêwî tê, rêbir yekser tifinga xwe dixe sînga wî û dibêje:

-Zû ke, lez ke, çi di bêrîya te de hebe derxe.

Rêwî:

-Bide xatirê Xwedê, min neşêlîne, bi dest û bêrîyên vala ez biçim malê jina min ê bi ser min de bike pite-pit, wê min rezîl bike.

Rêbir:

-Ger ez jî destvala biçim malê jina min jî wê min rezîl û riswa bike!



Institut kurde de Paris

**HÊ JÎ BÎST SALÎ YE**

Ji pîrejinekê pirsîn:

-Pîrê tu çend salî yî?

Pîrejinê got:

-Bîst!

Pîremêrek jî li wêderê bû, wî jî got:

-Bawer bikin, pêncî sal berê min jê pirsî "tu çend salî yî", her wê wextê jî digot "bîst".

Pîrejin:

-Binêrin, we bi xwe jî bihîst ku pîrika we çi rastgo ye, ez hê jî li ser qisê xwe me!

Institut kurde de Paris

**Mêrik ji dîya xwe dipirse:**
-Dayê Xwedê hebînî heta nuha
te çend mêr kirine?
**Dayik:**
- Wîîî kurê min, ma ez li ku, mêr li ku,
ma tu dibêjî qey çavê dîya te jî li mêra
ketîye,
tevîhev 13 ji Silîva, 12 ji mala kirîva,
yek Emerê Guhşelte,
yek jî rehmetîyê bavê te,
çirtik-pirtikên mayî jî
nayên bîra diya te!

Institut kurde de Paris